# Di Sedsala  Sykes Picot De  Dewrêşê Evdî Li Kobanî

**Dr. Mehmet Şirin Filiz**
**Mardin Artuklu Üniversitesi**

**DESTPÊK**

Netew û netewperestî mijareke gelekî tevlîhev e. Lewra gelek akademisyenên  wekî Gellner, Hobsbawn, Anderson û Smith li ser vê mijarê xebatên akademîk kirine, pirsa netew çi ye bixwe pirseke tevlîhev e. Çimkî li ser vê meselê gelek nîqaş hatine kirin. Li gor qewlê Anderson netewperestî bi serdema modern derketiye pêş lewra netew bixwe tiştekî texeyyûlkirî ye, ango tiştek çêkirî ye. (Anderson, 2014, bnr.) Hobsbawm jî wekî Anderson difikire û bi taybetî bi mînaka avakirina dewleta Îtalyayê vê îddîaya xwe piştrast dike, ew nimûneyek ji  Massimod' Azeglio tîne û dibêje; Massîmo gotiye baş e me Îtalya ava kir lê divê niha em îtalyanan jî ava bikin. Lewra di vê serdemê de kesên ku bî Îtalî diaxivin di nav sînorê Îtalyayê de pir kêm bûne. (Hobsbawn, 2010, r.62) Lê her çend têhega netewperestî têgeheke modern be û bi taybetî piştî şoreşa Frensî derketibe holê jî ew naye wê wateyê ku netew bixwe tunebûne wekî ku tê zanîn  beriya netewperestiye jî netewên wek ereb, fars, kurd û tirk hebûna. Yek forma netewbûne jî qabîle ne ango eşîr in, carina çend eşîr digihêjin hev dibin eşîrên federatîf û dewlet bajar jî ava dikin. (Hobsbawn, 2010 r.50) Eşîr wekî prototîpekî netewê ne lewra eşir ji mina neteweyeke ji komeke insana pêk tên ku li derdora gelek xalên hevpar yektiyek civakî ava kirine.

Anthony Smith dema behsa civakên etnîk dike dibêje  etnîsîte xwedî 6 taybetmendiyan ne. Ev taybetmendî ev in:

1.Navek an jî semboleke diyarkirî.

2. Mîtek derbarê bavikên hevpar de.

3. Bîr û çandên dîrokî yên hevpar.

4. Yek an jî zêdetirîn taybetmendiyên çanda hevpar.

5. Têkilyeke hevpar di navbera welat de.

6. Hevalbendiyek di navbera civakê de herî kêm di navbera elîtên wî civakê de.

Ew tiştên li jor hatine rêzkirin li gor qewlê Smith ji bo netewperweriya modern dibin taybetmendiyên ewilîn.  Lewra netewperweriya modern xwe li ser wan hîman ava dike. (Smith, 1999, r.13) Lê ew tiştên li vir hatine rêzkirin ji bo yekgirtina civakî yên beriya neteperweriya modern jî giring în. Lewra kesên wekî Jameson di wê baweriyê de ne ku Mît ango vegotina folklorîk beriya sekulerîzmê yekitiya qebileya saz dike rabûrdiya hevpar qaîm dike û sembolîzmeke havpar û bi saya vê vegotinê  hişmendiyeke civakî ava dike. (Jameson, 2008, r.62) Tabî eşîr û eşirtî ji bo civaka kurdan bi taybetî tiştekî gîrîng e. Çimkî ji serdema antîk bigrin heya demên modern kurdan xwe bi rêya eşîran organîze kirine û xwe bi rê ve birine. Heta mirov dikare bibêje ku di bingeha hemû emîrtiyên kurdan de eşîrek hebûye û ev eşîr di avakirin û birêvebirina dewletan de rolek gîrîng lîstine. Lewma jî di dîroka Kurdan de eşîr cihekî girîng digrin.( Torî, 2005, n.r. , 64-65) Yek ji van eşîran jî eşîra Milan e ku di dîroka kurdan de hem ji aliyê siyasî ve hem ji aliyê çandî û hunerî ve roleke sereke listiye. Ligel vê yekê ev eşir gelek berhemên folklorîk wekî Dewrêşê Evdî û Kerr û Kulik jî afirandiye.

Bûyera Dewrêşê Evdî di sala 1790an de qewimiye (Kıran, 2003 r.144), piştî bûyera Dewrêşê Evdî bi qasî sed û sî salî kurd dîsa tûşî rojên reş û tarî hatin bi taybetî bi peymana Sykes Picot welatê wan hate parçekirin û rastî zor û zehmetiyan hatin. Tenê welatê wan nehate parçekirin di heman demê de rih û mêjiyê wan jî hate parçekirin lê vegotina xwe yî gelerî tu carî wenda nekirin. Bo nimûne destana Dewrêşê Evdî li her çar parçeyê Kurdistanê heya niha jî tê vegotin bi taybetî di serdemên modern de ev destan ji bo netewperweriya kurdî bû prototîpek, em ê jî li gor van yekan li ser têkiliya vê destanê bi netewperweriya modern ya kurdan û bi bûyera Kobanî ve bisekinin. Gelo ev destan çawa û bo çi, ji destpêkê heya niha bûye sembola berxwedana kurdan.

**Eşîra Milan û Destana Dewrêşê Evdî**

Baş e, madem wisa ye ka em berê xwe bidin destana Dewrêşê Evdî ka gelo çi rola vê destanê di nava eşîra Milan de heye. Heger em bi kurtasî behsa eşîra Milan bikin ev eşîr eşîreke konfedaratîf e û gelek şaxên vê eşîrê hene. Di çavkaniyên Osmaniyan de herêmên eşîra Milan û şaxên wan ev der in: Erzirom, Diyarbekir, Çemîşgezek, Raqqa, Qeza Mecîdozu (Senceqa Amasyayê), Erxenî, Senceqa Teke, Senceqa Hemid, Sêwas, Elcewaz, Mêrdin, Kirşehîr, Çorûm, Senceqa Amasyayê, Qeza Heranê, Tokat, Senceqa Bozok, Kelkid, Şiran, Erzingan, navçeyên Erziromê û Riha.( Üner, 2007, r.55) Ji ber ku ev destan berhemeke eşîra Milan e wekî eşîra Milan ev destan jî li gelek heremên Kurdistanê berbelav bûye û hatiye vegotin lewra jî gelek şaxên vê destanê hene lê li vir em ê vegotina Baqî Xido ya ji hêla Şahîn Bekirê Soreklî ve hatiye latinezekirin bingeh bigrin. Heger em bi kurtasî behsa destana Dewrêşê Evdî bikin Dewrêş ji eşîra Şerqiya ye, Şerqî şaxeke ji eşîra Milan in û di nav eşîra Milan de bi mêrxasiya xwe têne nasîn. Dewrêş dil berdide keça paşayê Milan lewra jî rastî dijminahiya Paşayê Milan tê çimkî Dewrêş xortekî êzidî ye û ne mimkûn e ku zewaca xortekî êzidî û keçeke misilman pêk were. Lewra Dewrêş û hemû eşîra wî ji nav axa Milan têne mişextkirin. Dewrêş û malbata wî berê xwe didin Çiyayê Şengalê li wir jiyana xwe dibihurînin. Piştî demeke ji ber ku Şerqî ku şervanên Milan bûn, ji eşîra Milan veqetiyan eşîrên ku dijminê Milan bûn çavsorî li eşîra Milan kirin û di nav xwe de yektiyek ava kirin û berê xwe dan axa Milan, artêşa ji leşkerên eşîra Tirk û Gêsan pêk dihat û ji bo tunekirina eşîra Milan sond xwaribûn ev yek di vêgotina destanê de wiha xwe dide der.

*Dibê, wê çaxê, li ser van şorên bûk û keçê Tirk û Gêsan, serokê Tirk û Gêsan gihan di nav hev de sondek xwarin bi telaqê jinan ku illeh "Em ê bajone ser malê Milan û em ê konê Paşê Milan êgir berdinê û em ê sandiqê zêran ji bin konê wî derxînin. Pênc qîzê Milan hene. Em ê wan her pênc qîzan jî bînin nav qebîlê me Tirk û Gêsan. Çelengî û cemalê wan pir zêde ne û nav û dengê xwe li alemê belav bûne. Bira xort û ciwanê me Tirk û Gêsan li husn û çelengiya wan qîzikan bikin temaşan: Yek Beyaza Hemo, hîva li çardan; yek Fetûma Elo Sincar, xezala li çolan; yek Edûla Kîkî, xwedana çelengî û cemala giran; yek Gozel Xatûn, xweyinga Çîloyê Îzolî, tercumana pênc xûşkan; yek jî Edûla Axê, serfiraza sî û du hezar malê Milan.(Baqî Xido)*

Piştî vê tifaqa şer eşîra Milan dikeve nev metirsiyekê. Çimkî şerwanên wan ji wan veqetiyane û tu kesekê ku li ber wan de şer bike nemaye çongên wan ji tirsan şikiyaye. Paşayê Milan neçar dimîne ku berê xwe bide eşîra Şerqiyan û Dewrêşê Evdî lewra jî hileyek tê bîra wî û dibêje, heger kî barê şer bigre ser milê xwe ez ê Edûlê bidime wî ew name digihije Dewrêşê Evdî jî her çend bavê Dewrêşê Evdî, Evdê Milhim kurê wî biçe şer bê kuştin jî evîna Edûlê di dilê Dewrêş de bûye pêt û ar û wî dişewitîne lewra jî Dewrêş diçe bi tevî havalên xwe barê şer digre ser milê xwe. Piştî vê astê destan ji formasyona evînî derdikeve û êdî dibe destaneke civakî lewra Dewrêş edî tenê ne ji bo Edûle bedew şer dike, ew edî lehengê axa Milan e û di ber eşîra Milan de şer dike. Bo nimûne dema

îxtiyarek Gêsî tê pêşiya Dewrêş û jê re dibêje heger tu ji bo Edûla bedew şer dikî were du keçê min î bedew hene ez wan bidim te vegera mala xwe lê Dewrêş vê yekê qebûl nake. Lewra ew êdî lehengekî civakî ye ev rewş di destanê de xwe wisa dide der:

*Bavê Kalo dilê min lîyan e, te bi wê şorê berada dilê min xûrî pêt arê darane. Tu dikî lekakê li daw û etega min xînî, ji daw û etega min nare heta serê xwe didim axa kendal û gornane. Alem û dinê wê bibêjin: " Kurê Evdoyê Şerqî berdaye cerd û beregê Tirk Û Gêsan, çû qûweta xwe ceriband kalekî heft û du salan e." Rica min ji te heye Bavê Kalo ji min veger ka bibêje hîro cerd û bêregê we li kuderê ne? Da ku ez bi rehetî piştê xwe bidime te û berê xwe bidim hevalan"(Baqî xido)*

Piştî van bûyeran Dewrêşê Evdî berê xwe dide qada cengê pişta xwe dide girê Etşanê û bi tevî duwanzdeh hevalên xwe bi mêranî li hember artêşa Tirk û Gêsan şer dike. Dewrêş û hevalên xwe hemû di qada cengê de têne kuştin lê hejmareke zêde ji artêşa tirk û Gêsan jî dikujin. Ev mêrxasiya Dewrêşê Evdî ji bo eşîra Milan dibe nimûneyek û êdî ew jî newêrekiya xwe ji ser xwe diavêjin yekitiya xwe saz dikin û berê xwe didin qada cengê û axa xwe rizgar dikin.

Destana Dewrêşê Evdî ji bo eşîra Milan destaneke herî girîng û navdar e çawa ku li jor hate destnîşankirin ku eşîra Milan li gelek heremên Kurdistanê belav bûye destana Dewrêşê Evdî jî bi heman awayî ji deşta Sûrûcê bigrin heya Kafkasyayê berbelav bûye û ev destan ji bo eşîra Milan bûye semboleke berxwedanê lewra heya serdemê modern jî ji hêla gelek dengbêjan hatiye vegotin.

**Dewrêşê Evdî û Neteperweriya Modern**

Wekî ku li jor jî hate vegotin destana Dewrêşê evdî ji bo yekgirtin û hevalbendiya eşîra Milan roleke serek lîst ev rola destanê bi tenê eşîra Milan sînorkirî nema. Çimkî berhemên folklorîk ji aliyê civakî û aborî ve taybetmendîyên civaka kevnara di nav xwe de bihewîne jî bi borandina demê vê li gor şert û mercên civakê, ev berhemên folklorîk jî rastî hin guherînan dihatin. Ev guherîn ne tenê di çanda maddî de her wiha di ziman û hunerê de jî pêk dihat (Sokolov, 2009, r.21). Baş e madem foklor bi guherindina demê ve li gor şert û mercê civakê diguhire de ka em berê xwe bidin sedsala 20em de çi guherîn di destana Dewrêşê Evdî de çêbûye?

Helbet teqez mirov dikare bibêje sedsala 20em sedsala bilindbûna netewperweriyê ye. Anderson dema behsa netewperweriya modern dike dibêje ku her netew ji xwe re rehên dîrokî û çandî ava dikin û gelek caran ev rehên dîrokî tiştên çêkirî ne. Bo nimûne leşkerê meçhûl nimûneyek balkêş e ji vê yekê. Lewra di rastiya xwe de karaktereke wisa tuneye û gora leşkerê meçhûl jî vala ye tu kesekî li wir ranazaye an jî bi awayeke zanebûn ev gor vala hatiye hiştin.(Anderson, 2014, r.23) Anderson di wê baweriyê de ku netewperwerî tişteke tiştek çêkiriye lê wekî me li jor ji rawe kir rehên civakî ne tenê di serdema modern de ji bo yekgirtina civakî pêdiviyeke ne her wiha di nav civakên kevnare de jî ji bo hevgirtina civakî roleke sereke dilîstîn. Di serdema modern vegotina folklorîk ji bo pêdiviyên demê û avakirina neteweyeke bêtir derketin pêş. Helbet ev daxwaza netewbûne ne tenê di metnên modern de, di heman demê de di vegotinên dengbêjan û di xwendinên neteweyî de jî xwe dide der. Bo nimûne Remezan Alan di berhema xwe ya bi navê *Folklor û Roman* de li ser vê yekê disekine û dibêje ku li Sovyet û Çînê folklor ji bo avakirina netewe û dewletekê bûye amûreke bêhempa. Heta mirov dikare, berhevkirinên berhemên folklorîk ên kurdên kafkasyayê di vê çerçoveya de binirxîne. Îro li başûre Kurdîstanê heger eleqeyek mezin hebe ji bo folklora kurdî, ev jî dîsa ji ber van sedeman e. Ango folklor ji bo avakirina neteweyekî amûrek e. (Alan, 2013, n.r. 31-39) Çawa ku di serdema beriya netewperweriyê vegotina foklorîk di hevgirtina civakê de roleke sereke dilist. Di serdema modern de jî avakirina nasnameyeke civakî li hember sekulerîzma û parçekirina civakî folklor dîsa derket pêş û gelek civakên modern ketin pey şopa

nasnameya xwe ya kollektîv, em kî ne û ji kuderê hatine bavik û kalikê me kîne xwestin bi saya van pirsan di navbera civakê de hevgirtineke civakî ava bikin. (Smith, 1999, r.60) Helbet kurd jî weke civakên cihanê ketin pey şopa bavik û kalikên xwe û xwe wekî zarokên Medan û Kawayê Hesinkar dîtin.

Li gor vê rewşê destana Dewrêşê Evdî jî ji ber ku destaneke popûler bû û de gelek deverên Kurdîstanê de dihate vegotin herî zêde derket pêş. Ji bîlî şaxên destanê yên hatine deşîfrekirin û stranên hatine vegotin, çar roman li ser vê destanê hatin nivîsandin û mirov dikare bibêje ku di vê serdemê de destana herî popûlar ya ji bo netewperwerriye kurdan destana Dewrêşê Evdî ye. Bo nimûne di berhevkirinên Amer Çelîk kalikeke êzîdî bi vî rengî diaxive:

*Ezbenî, gelê kurd, gelê kurmanc bêtifaq e! Bê çima? Eşîr li dijî hevû û dinin, Xwîna hevdû bê sedem dirjînin. Dijimên wan bi kêfa xwe bi wan dilîzin, bawer bikin! Heger birayên me yên kurd, kurdên Misilman ne dane pêşiya eskerên Romiyan, Roma reş, eskerên Romê bi tene xwe newêrin werin ser gundên me. Lê çi bêjim ji bo kêm aqilan! Çi bêjim ji bo nezanan! Dijimê qewmiyeta xwe ne. Birano roja dawî kesek ji bilî me,xêra me naxwaze! (Çelik, r.34)*

Weki ku li jor jî tê xûyakirin ev kalikê ezidî ne mîna endameke eşîra Milan lê mîna neteperwerekî hêja diaxive. Lewra em baş dizanin ku şerê Dewrêşê Evdî ne li hember eskerê Romê bû, Dewrêş li hember eşîrên cîran ku çavsorî li eşîra Milan dikirin şer kiribû û hatibû kuştin. Lê piştî du sed salan ji ber şert û mercên demê destana Dewrêşê Evdî bi texeyyûlên netewperweriyê bi destê kurdan careke din ji nû ve hate nivîsandin. Dewrêş êdî ne xelaskarê axa Milan lê lehengê axa Kurdistan e. Ew jî nîşan dide ku çawa ev destan di serdema modern de ji bo armancê neteweyî ji nû ve hatiye avakirin.

**Dewrêşê Evdî û Kobanî**

Weki ku li jor jî hate vegotin sedsala 20em sedsala neteperweriyê bû lê mixabin kurd ji vê bayê piçekî dereng haydar bû lewra dema hatin ser hişê xwe welatê wan bi destê emperyalîstan bêyî vîna wan di navbera çar dewletan de hatibû perçekirin. Ji sedsala 20em heya niha kurd bi awayeke fizikî hatibûn perçekirin. Kurdistan di nav krîzê de bû kuştin û talan li her çar perçeyên Kurdîstan bibû kareke ji rêzê. Di nav vê krizê de, folkor wê carekê din weke amûreke hevgirtina civakî derkeve pêş.

Alan Dudes di gotara xwe ya bi sernavê Fabrîkasyona Foklorê de dibêje ku di serdemên krîzê de folklor ruhê netewperweriyê temsîl dike bi saya lehengên folklorîk gel bîr û baweriyeke netewî ava dike û ew leheng dibin lehengî neteweyî û xelaskarê axa welat.(Dudes, 2007, 82) Piştî peymana Sykes Pîcot bi qasî sedsalan krîzeke nû rûda ji bo kurdan. Ew krîz krîza bûyera Kobanî bû. Kobanî yek ji bajarên kurdên rojava bû. Wekî ku tê zanîn piştî şerê navxweyî ya li Sûrî ji ber ku valahiyek rêveberiyê çêbû kurd vê valahiyê tije kirin û bi awayeke organîzekîrî rêveberiya gelek deverên rojava dest bi xistin yek ji wan bajarên ku rêveberiya wê di destê kurdan de bû bajarê Kobanî bû. Di sala 2014an de gundên derdora bajarê Kobanî ket destê Daeşê, Daeş bi hemû hêza xwe êrişî Kobanî kir di destê wan de çekên giran hebûn û derdora Kobanî hatibû dorpeçkirin. Di vê keliyê de ji ber ku rêyên ku Kantonan bi hev girê didan ne di destê kurdan de bûn, ji Kantonên din jî alikarî ne digihişt Kobanî. Pişta Kobanî li sînorê Tirkiyê bû lê sînorê Tirkiyê ji alikariya leşkerî re hatibû girtin. Bi deh hezaran însan berê xwe dan sînorê Tirkiyê û li wir bi cih bûn. Daiş hêzeke wisa barbar bu ku tirs û xofa Daeş sînoran derbas kiribû gelek bajarên wekî Misûl bê berxwedan ketibû destê vê

hêza hov. Her wiha nav û dengê Daeş wisa berbelav bibû ku wekî makînayeke şêr dihat dîtin. Lewra tu hêz nikaribû di ber vê makinaye şer de bisekiniya.

Ew îmaja Daeşê ku li hemû deverê cîhanê berbelav bibû helbet çavê gelek kurdan jî tirsandibû. Kobanî bi tevahî wala bibû û tenê çend hezar şervanên kurd di bajêr de mabûn. Ev şervan bi bîr û baweriyeke zexim sond xwaribûn ku li Kobanî bimrin jî axa xwe bernadin. Çawa ku Derwêşê Evdî ji bo ku axa Milan biparêze barê şer girtibû ser milê xwe û berê xwe dabû qada şer li hember artêşeke mezin şer kiribû, şervanên Kobanî jî li hember vê makineya şer axa xwe bernedan û li ber xwe dan. Ew werektiya şervanên Kobanî li hemû deverên cihanê deng veda û kurdên ku bi awayeke fîzîkî hatibûn parçekirin piştî sedsalan bi avayeke rûhî careke din bûn yek parçe, li hemû deverên cihanê ji bo Kobanî çalakî hatin lidarxistin. Li Ewropayê balafir hatin îşgalkirin li Tirkiyê çalakiyê girseyî hatin lidarxistin li rojhilatê Kurdîstan çalakî hatin pêkanîn û êdî her deverê cîhanê de kurdên ji aliyê siyasî û cîvakî ji hev cuda difikîrîn li ser bûyera Kobanî bûn yek parçe. Tirkiyeyê mecbûr ma ku sînorê xwe ji pêşmergeyan veke û cara yekem pêşmerge bi tevî çekên giran ji axa Tirkiyê derbas bûn û berê xwe dan Kobanî, pêşmerge di vê rêwitiya xwe de rastî eleqeyek mezin hatin û kurdên Tirkiyeyê bêyî organîzekirina saziyeke çûn pêşwaziya pêşmergeyan. Ev yektiya kurdan ji ber ku di hemû cîhanê de deng veda, hêzên koalîsyonê jî alikarî dan şerwanên Kobanî û axa pîroz bi awayeke kollektîf bi hevgirtineke netewî ji dagirkeriya Daeş hate rizgarkirin.

Di dema rizgarkirina Kobanî de destana Dewrêşê Evdî ji bo hevgirtina civakî û armancên civakî hate bikaranîn. Wekî ku li jor jî hate behskirin destana Dewrêşê Evdî bi taybetî di serdema modern de wekî amûrekî netewperweriyê hatibû bikaranîn. Digel vê yekê ji ber ku bûyera Dewrêşê Evdî li deşta Sirûcê pêk hatiye ev destan li herêma Kobaniyê ji baş dihat zanîn û ew destan di şerê Kobanî de zêde derket pêş. Bo nimûne dengbêj Baqî Xidoyê ku destana Dewrêşê Evdî vegotiye ji herêma Kobaniyê ye û disa dengbêj Hesenê Gulê jî ji deşta Sûrûcê ye. Lê yek taybetmendiyên destana Dewrêşê Evdî jî ew e ku serokê pkk Ebdullah Ocalan li ser vê destanê helbesteke bi tirkî nivîsandibu.

*Ji Derwêş re*
*Xwezî niha ez li çiyayê Sîncarê di kêleka Dewrêşê Evdî bûma*
*Li ser hespên boz min xwe berdana deşta Misûlê!*
*Dema Derwêş hate birîndarkirin min wî hilgirtana û bibirana çiyayê Kurdîstanê!*
*Min ji wî bigotana! Binêre bi deh hezaran Edûlê û duwanzdeh siwarî hene li vir*
*Min jê bigota! Li çiyayên ku Xwedawend cihê xwe xweşkirine bi kêfxweşî raze.*
*Mirin ji ku û çawa tê bila*
*êdî bê xem neke!*
*Û min bigota tiştê herî rast li van çiyayan kurdayetî û jiyana azad e! (Abdullah Ocalan)*

Lewra jî ev destan di nav aligirên Pkk de bêtir derket pêş. Ji bîlî vê helbestê gelek helbestên din li ser destana Dewrêşê Evdî hatin vegotin. Dewrêşê ku xilaskarê axa Milan bû êdî xelaskare axa Kobanî bû, şervanên kurd êdî xwe wek neviyên Dewrêş û Edûlê dîdît. Çimkî bûyera Kobanî û Dewrêşê Evdî wekî ku li jor jî hate rawekirin ji gelek aliyan ve dişibiya hev. Welatekî talankirî bi werketiya lehengên îdeal tê rizgarkirin. Her wiha ev wêrektiya lehengan di navbera civakeke parçekirî de hevgirtineke ruhî û civakî ava dike. Lewra jî mirov dikarê fêm bike çima destana Dewrêşê Evdî di bûyera Kobanî de bû sembola berxwedanê. Kurd bi saya bûyerê Kobanî piştî sed saliya hevpeymana Sykes Picot yekitiya xwe ne bi fizîkî lê bi awayeke rûhî û civakî careke din ava kirin.

**Encam**

Me di vê xebatê de xwest ku em nîşan bidin çawa destana Dewrêşê Evdî ji bo armancên civakî hatiye bikaranîn. Me dît ku ev destan ne tenê di serdema modern de her wiha di serdema feodal de ji bo hevgirtina civakî wekî navgîneke hatiye bikaranaîn. Her wiha di serdema modern de jî ji bo yekgirtina neteweyî û avakirina çandeke hevpar ev destan dîsa derketiye pêş û vê carê ji bo armancên netewî hatiye bikaranîn.

Dîsa di dema bûyera Kobanî de ev destan ji bo armancên civakî hatiye bikaranîn û şervanên Kobanî wekî Dewrêş û Edûlêyên hemdem hatine pênasekirin. Ev hemû tişt didin nîşandin ku destana Dewrêşê Evdî ji serdema feodal heya serdemên modern, ji bo armancên civakî û netewperwerî wekî navgînekî hatiye bikaranîn.

**Çavkanî**


Amer Çelîk, *Evîndar û Qehreman*,

Anderson, Benedict: *Hayali Cemaatler*, Metis Yayinlari, ç.7, wer. Iskender Savaşır, İ stanbul. 2014

Dudes, Alan: di nav *Fakelore* de edt. Selcan Gürçayır, wer.Selcan Gürçayır, Aslı Uçar, Geleneksel Yayıncılık, Ankara, 2007

Hobsbawm, Eric. J. : *Milletler ve Milliyetçilik*, Ayrıntı Yayınları, wer. Osman Akınhay, ç.4. , 2010

Kıran, Eyüp: *Kürt Mılan Aşiret Konfederasyonu*, Elma Yayınları, Stenbol, 2003.

Kıran, Eyüp: *Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizêk û Rim*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2011.

Osman, Îbrahîm: *Evîna Mêrxasekî*, Weşanên Lîs, Diyarbekir, 2008.

Özkırımlı, Umut: *Milliyetçilik Kuramları Eleştirel Bir Bakış*, Doğu Batı Yayınları, Ankara, 2013

Remezan Alan: *Li Dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyîn Folklor û Roman*, weşanên Peywend, Stenbol, 2013

Smith, Anthony D. : *Myths and Memories of the Nation*, Oxford University Press, Newyork, 1999

Sokolov, Yuri M. : *Folklor Tarih ve Kuram*, Gelneksel Yayıncılık, Ankara, 2009.

Jameson, Fredrîc: *Modernizm İdeolojisi*, Metis Yayınları, wer. Kemal Atakay, İstanbul, 2008

Uluçay, Dr. Ömer: *Dewrêşê Evdî Destanı*, Do Yayınları, İstanbul, 2006.

Üner, Mehmet Emin: *Aşiret, Eşkıya ve Devlet*, Yalın Yayınları, İstanbul, 2007.

Torî: *Aşiretten Millet Olma Yapılanmasında Kürtler*, Doz Yayınları, İstanbul, 2005

Soreklî, Şahîn Bekirî: *Dewrêşê Evdî bi Vegotina Baqî Xido*, http://www.kobanikurd.com/dewrese-evdi-baqi-xidosahine-bekire-sorekli/, 12.04.2014

Di sala 1916an de li gor peymana Sykes Picot Kurdistan bêyî vîna kurdan di navbera dewletên emperyalist hate parvekirin. Piştî vê peymanê ji bo kurdan rojên reş dest pê kirin.. Êdî kurd li ser axa xwe ne xwedî tu mafan bûn, welatê wan hêza wan berbelav bibû. Piştî sed salan  Kurdistan li Kobanî bi awayeke cografîk nebe jî bi awayeke ruhî careke din  bû yek parçe. Kurdan li ser bûyera Kobanî reaksiyonek hevpar nîşan dan û Kobanî bû sembola yekitiya kurdan. Ligel vê yeke, bûyera Kobanî bi destana Dewrêşê Evdî hate pênasekirin û gelek caran şervanên Kobanê wekî Dewrêş û Edûlê hatin dîtîn. Li gor  destana Dewrêşê Evdî  hêza eşîra Milan  berbelav bibû û eşirên tirkmen  û ereban yekitiyek li hember eşîra Milan saz kiribûn. Dewrêş Evdi weke qehremanek ideal derdikeve pêş, barê şer digre ser milê xwe û bi saya wêrektiya Dewrêşê Evdî eşîra Milan axa xwe rizgar dike. Em ê jî di vê gotarê de li ser van yekan bi hûrgilî bisekinin û dê em ê hewl bidin çawa ew destan wekî mîta Kawa bûye sembola netewbûna kurdan û li ser motîfên hevpar ên bûyera Kobanî û Dewrêşê Evdî bisekinin. Li gor vê pênaseyê dê bê dîtîn ku gelek xalên hevpar di navbera bûyera Kobanî û destana Dewrêşê Evdî de hene.

**Bêjeyên sereke**: Eşîra Milan, Dewrêşê Evdî, Netewperwerî, Kobanî

## At Sykes Picot Anniversary, Dewrêşê Evdî in Kobanî

In 1916, according to Sykes Picot Agreement, Kurdistan was shared among imperialist states without Kurdish peoples will.  Since that time, Kurdish have gone through bad times. Kurds have had no longer right to speak about their own country and their power have been broken into pieces. After 100 years, Kurdistan has been united over Kobanî not geographical but spiritual. Kurds show a collective stance to Kobanî case and Kobanî has became a symbol uniting kurds. In addition to that stituation, Kobanî has been identified like the epope of Dewreşê Evdî and Kobanî fighters has been generally seen as contemprary Dewreş û Edûle, the characters of the epope. According to the epope,  the forces of Milan tribe fell apart and Turks made an alliance with arabs tribes against Milan tribe. As an ideal hero, Dewrêşe Evdi came forward and undertook the hardships of the war, Milan tribe liberated its lands thanks to Dêwrêşê Evdis' courage. We will focus on both these features and common motifs in detail between Kobanî and the epope and make an afford how the epope becomes symbol in nation building as Kawa myth. In this context, we will see that there are many common trait between Kobanî case and the Epope.

**Key Words:** Milan Tribe, Dewrêşê Evdî, Nationalism, Kobani,